Ji wê rojê û heta roja îro tevî ku gelek kes derketin rexne li elfebêta Mîr Celadet girtin bi hênceta ku tîpên wê kêm in û nizanim çi kêmasiyên wê hene, lê ev 83 sale ku ev elfebêt berdewam e, Kurd pê dinivîsin, fikir û ramanên xwe pê ji hev re vedguhêzin bi hemî şêwezarên zimanê Kurdî bêyî ku ti kêşeyên gewre li pêşiya vê elfebêtê derkevin. Heta ew kesên ku dibêjin kêmaniyê vê elfebêtê pir in bi eynî vê Elfebêtê dinvîsin û dema tu ji wan re dibêje bas e ji bo çi hûn bi Elfebêta "Temam" pirtûk an gotarên xwe belav nakin vê bersivê li te vedgerînin: "Ma xelk hemî li ser vê elfebêtê fêr bûne û heger em pê nenivîsin êdî kes van pirtûkan naxwîne"*
Ev delîlê serkeftina vê elfebêtê ye ku xelkê ew pejirandiye û dikarin di riya wê re tiştê bixwazin bighînin.
Helbet her kesê ku kedek kiriye ji bo parastina zimanê me keda wî pîroz e, lê mercên serkeftina her karekî ew e ku xelk wê bipijrînin û bibe sîstemek ji wan re.
Tevî vê nimûneya serkeftî ku wextî bibe 100sal, lê hîna jî Kurd ne bi yek Elfebeyekê dinvîsin û ev yek dibe sedema gelek nakokiyên mezin li pêşiya miletê Kurd û çanda wî li herêmê û cîhanê de,nemaze ku Îro rewşa Kurdistanê ne wek ti demên derbasbûyî ye, û Kurdistan bi taybet Başûrê Kurdistanê bûye wek qubleyek cîhanî welatiyên derdora 50 welatî lê dijîn û kar dikin û pêwîstiya wan bi zimanê Kurdî heye ji bo karibin li Kurdistanê karê xwe berdewam bikin, herwiha Kurdên her sê perçeyên din bi sedan heger ne bi hezaran bin li Başûrê Kurdistanê berdewam dijîn, ji bilî rewşa doza Kurd li ser asta cîhanê û pêşketinên ku di vî warî de çêdibin.
Ev hemî pêwîstiya Kurdan bi Elfebêtek yekgirtî an elfebêtek sitander heye da ku karibin xwedî zimanekî şaristanî, hesan û pêşketî bin.
Ez bi omîd im ku Roja Zimanê Kurdî bibe rojeke zanistî ji bo hewlên bikaranîna yek elfebêtê ji bo hemî şêwezarên zimanê Kurdî.
Û diyar e ku rola Başûrê Kurdistanê û zimanzanên Kurd dê di vê pirsê de serekî be.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Ji Romanê Têr Nabe, Ji Nivîsandinê Qut Nabe, Dûrbîna Pênûsa Wî Zuha Nabe: Romannivîsê Kurd Helîm Yûsiv Ji "Bûyerpress" Re Daxive.

- Min her digot; eger vegereke mina Amûdê hebe wê di tabûtê de be.

- Demek derbas bû her kes helbestvan bû, niha jî demek tê wê her kes romannivîs be.

- Rast e, ez ne li Amûdê me, lê Amûdê li vir bi min re ye.

- Her ku min çîrokeke xwe dixwend, rexneyeke bi vî rengî li çîroka min dibû: "- Kurteçîroka te bi nefesa romanê hatiye nivîsandin".

- Hinek hene tenê li gor sûkê dinîvisînin. Rewaca çi heye berê xwe didin wê. Ji wan weye ku dema sûka romanê hebe, ew jî romanan binîvisînin.

- Libên wê tizbiyê belawela bûn. Min pêncî û neh lib dan hevdu û çil jî windayî man. Roman ji wan pêncî û neh beşan pêk tê.

Hevpeyvîn: Ehmed Bavê Alan

Ev Hevpeyvîn Bi Boneya Derketina Romana Helîm Yûsif Ya Bi Navê " 99 Morîkên Belavbûyî" Hatiye Kirin

- Di serî de em dixwazin hûn xwe ji xwendevanê rojnameya "Bûyerpress" re bidin nasîn?

Ez ji hundir ve zarokekî Amûdî me û ji derve ve mêrekî ku çil û pênc sal derbas kirine. Ne ew zarok di hundirê min de mezin dibe û ne jî ew mêr dikare rê li ber derbasbûna demê ya bi lez û çûna ber bi kalbûnê ve, bigre. Di zarotiya xwe de hergav bi du lingên xwas di nav toz û tirabêlka Amûdê de li pey çikçikan, gambelek û çipikên terîsor û xewnên mezin bûm. Niha jî bi dilekî xwas di nav serme û seqema Ewrupayê de li pey her du lêvên azadiyê yên sor, her du çavên rûmetê yên xweşik û hin bermayiyên xewnên biçûçik de me. Heta berî demekê, min her digot; eger vegereke mina Amûdê hebe wê di tabûtê de be. Niha piştî ku çavreşên me, kezîsorên me, tabût şikenandin, hêviya vî mêrê ku zêdeyî nîvê temenê xwe li pey xwe hiştiye heye ku di jiyanê de careke din Amûdê bibîne.

- Kengî Helîm Yûsiv dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kir, û çima?

Nivîsandina mina bi zimanê Kurdî ji biçûkanî de bû. Ez zarok bûm gava ez li malê hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bûm. Yekemîn çîroka mina bi Kurdî "Guhê jêkirî" bû û di kovara Zanîn de, ku di sala 1988 an de li Qamişlo derdiket, belav bû. Wisa jî yekem pirtûka mina bi Kurdî "Mirî ranazin" bû ku di 1996 an de li Stenbolê derket. çima min bi Kurdî nivîsand, ji ber ku ez Kurd im. Tiştê herî xwezayî û normal ew e, ku mirov bi zimanê xwe binîvisîne.

- We bi zimanê Erebî jî nivîsandin kiriye, çi cudahiya nivîsandinê di navbera herdû zimanan de heye?

Nivîsandina bi zimanê Erebî ji bo Kurdekî, ne tiştekî normal e. Wekî mirov ji çermê xwe derkeve. Wisa jî ji xwezayiya xwe dûr bikeve. Deh salên destpêkê ji nivîskariya min, ji ber şert û mercên ku hûn hemû dizanin, pirtûkên min tenê bi Erebî derdiketin. Gava ku li Turkiye û Bakurê Kurdistanê qedexekirin ji ser Kurdî, heta radeyekê rabû, û weşanxaneyên Kurdî çêbûn, derfeta vegera li çermê xwe, li xwezaya xwe û li rewşa xwe ya normal li ber min vebû û ez li xwe vegeriyam. Di baweriya min de vegera li nivîsandina bi Kurdî ji bo me, vegera li rewşa normal e. Lê mesele wilo lê hatiye ku nivîsandina bi Kurdî wekî rewşeke ne normal tê dîtin. Ev jî encama serkeftina pilan, siyaset û pirojeyên dijminên Kurdan e.

- We nivîsandina çîrokê li ku derê hiştiye?

Deh salan min tenê çîrok nivîsandin. Her ku dem derbas dibû, êş mezin dibû pê re jî şewata di kûrahiya rihê mirov de. Ne êşên min, ne jî qêrînên hundirê min nema di kirasê çîrokê tenê de hildihatin. Ez tim dibêjim, ku roman ji bo min mîna avahiyekê ye ku dil û hiş tê de bi cih bûne, çîrok jî odeyeke ji wê avahiyê. Piştî çûn û hatina deh salan di wê odê de, bêhna min êdî teng dibû û pêdiviya derdên dil û fikarên hiş bi cihekî berfirehtir, bi hemû avahiyê hebû. Lê bi avakirina avahiya mezin re, min dev ji oda xwe ya destpêkê jî berneda. Ji ber vê heta niha di ber nivîsandina romanê re, di nivîsandina çîrokan de jî berdewam im.

- Hûn çawa hînî nivîsandina romanê bûne?

Nizanim. Lê di şevbuhêrkên wêjeyî de yên ku me li Helebê, di dema xwendina zanîngehê de, çêdikirin, her ku min çîrokeke xwe dixwend, rexneyeke bi vî rengî li çîroka min dibû: "- Kurteçîroka te bi nefesa romanê hatiye nivîsandin". Ew rexneya ku dihat dubarekirin çavê min li ser vê rastiyê vekir, ku di nivîsandina romanê de ez ê pêrgî ti zehmetiyên mezin neyêm û wilo jî bû. Romana mina yekem Sobarto bû, ne gengaz bû ku ez karibim wê êşa mezin ya di hundir rûpelên wê romanê de di kurteçîrokekê de kom bikim. Ew roman pijiqandina rih, hiş, hinav, hest û cergê min bû, şewata porê min û serê tiliyê min û şikestina qurmê zimanê min bû. Ji bilî romanê wê ti celebên wêjeyî yên din nikarîba wê pijiqandinê, wê şewatê, wê felaketê di hundirê xwe de hilgire.

- Berûvajî vê jî heye, ku helbestvan yan jî çîroknivîs çaxa têk diçe romanê dinvîse?

Demek derbas bû her kes helbestvan bû, niha jî demek tê wê her kes romannivîs be. Hinek hene tenê li gor sûkê dinîvisînin. Rewaca çi heye berê xwe didin wê. Ji wan weye ku dema sûka romanê hebe, ew jî romanan binîvisînin wê bibin afirênerin serkeftî. Nexasim di nav Kurdan de ku rexnegirî tuneye û xwendevan jî kêm in û hayê kesî ji asta berheman tune ye. Ji bo hin kesan jî têra wan dike ku berî navê wan peyva romannivîs hebe. Ji evên ku helbest dinîvisandin û tiştek ji wan derneket werê ku sûcê helbestê ye û ne yê wane. Ji ber vê bi kêfxweşiyeke mezin berê xwe didin nivîsandina romanê û bi vê yekê têkçûna xwe ya di afirandinê de vedişêrin. Piraniya helbestvanên ku tên romanê dinîvisînin bi vî awayî ne. Îca nema dimînin helbestvan û ne jî dibin romannivîsin baş. Jixwe ev nayê wê wateyê ku ev nirxandin li ser her kesî dimeşe, lê em behsa piraniya nimûneyên bi vî rengî dikin.

- Li ser romana xwe (99 Morîkên Belavbûyî) û naveroka wê ji xwendevanan re hinekî biaxive?

Çirîska yekê ya vê romanê di sala 2002an de, di serê min de, rû da. êvarekê, Kurdekî derdora şêst salî li bajarekî Elmanyayê li kolanê dimeşiya û ji piştve bi destê xortekî elman ê ku nû ji hebsê derketibû hat kuştin. 99 morîk jî ew hejmara navên Xwedê ye û hejmara morîkên tizbiyê ye. Ew tizbî evîndara wî ya li Amûdê dabû wî û wî jî bi xwe re hilanîbû. Gava ku ji qama xwe de hat xwarê ew tizbî li şûna se'etê di destê wî de bû. Libên wê tizbiyê belawela bûn. Min pêncî û neh lib dan hevdu û çil jî windayî man. Roman ji wan pêncî û neh beşan pêk tê. Li ser naveroka romanê zêde nizanim çi bibêjim, encex mirov bixwîne hetanî ku naverok zelal bibe.

- Dibêjin ku xewn û xeyal dibin roman, lê tê gotin ku Helîm Yûsiv rastiyê dike roman, Gelo "Rastî" dibe roman?

Ji roja ku min dest bi nivîsandinê kiriye, çi çîrok be, çi roman be, hema hema di hemû berhemên min de du xet hene. Xeta reyalîzmê ku hûrgiliyên rastiya jiyana me ya rojane ne, û xeta din jî ji xewn, fantazî û xeyalê pêk tê. Heta ji min tê ez herdu xetan bi harmoniyeke hunerî bi hev re dimeşînim. Ji bilî wê hilbijartina wan rastiyên em behsa wan dikin pir giring e. Hinek kes newêrin destên xwe bavêjin bin cilikan û tiştên veşartî derxînin. Hinek jî ji ber xwekontrolkirineke exlaqî, civakî yan jî siyasî tiştina bincil dihêlin. Ji bo min, ez bi çavê sisiyan li dora xwe dinerim û dinîvisînim. Mebesta min ji çavê sisiyan ew e, dîtin, derxistin û nivîsandina wan diyarde û kirinan ewên ku hene, lê her kes wan nabîne, yan jî naxwaze wan bibîne.

- Hûn çi ji welêt û çi ji biyaniyê di romanên xwe de dirêsin?

Ji sala 2000 î de ku ji welêt derketime û heta niha hemû berhemên min ên ku derketine hem jiyana li welêt û hem jiyana li derbideriyê û li xerîbiyê di wan de cih digrin. Ev mesele jixwebere û bêyî pilankirin hatiye holê. Ev jî dide diyarkirin bê nivîsandin heta çi radeyê bi jiyana nivîskar bi xwe ve girêdayî ye. Derketina ji welêt ji bo nivîskarekî dikare gaveke erênî be, lê dikare di heman demê de gaveke neyênî jî be. Aliyê erênî ew e, ku dûrketin welat û jiyana li welêt hemuyî dike bîranîn. Di bîranînan de jî her tişt zelal e, pijiyaye û gihiştiye dawiyê, bi gotineke din bêhtir tê dîtin. Aliyê neyênî jî ew e, ku nivîskar mîna darekê ye, gava ku rehên wê darê ji erda xwe bên rakirin, wê ew dar zuha û bê ber bimîne.

- Wek romannivîsekî Kurd, hûn nabînin ku niha destan û efsane çêdibin, û pêwîst e wek ku rojnamevan tên raporan çêdikin, gereke romannivîs jî werin û wan destanan bikin roman?

Ji bo rojnamegeran pêdivî bi hatinê û şopandina bûyerên rojane heye, yana wê nikaribin karê xwe baş bikin. Ji bo romannivîsekî, li gor dîtina min, pêdivî bi beşdariya di van bûyerên rojane de tune ye. Ez cudayiyeke mezin di navbera karê rojnamegeran û yê romannivîsan de dibînim. Wekî mînak, piştî avakirinê, rojnamevanek nikare bê û raporeke serkeftî li ser şer û berxwedana efsaneyî ya ku li Kobanî rû da amade bike. Lê romannivîsek dikare piştî deh salên din jî romaneke serkeftî li ser vê mijarê binîvisîne. Bê guman dîtin ji nedîtinê çêtir e, lê ji bo romannivîsandinê ne şert e.

- We karê ragihandin û çapkirinê jî kiriye, li ser programa xwe ya wêjeyî hinekî biaxive?

Ez berî sala du hezarî ji Amûdê derketim, heta wê gavê her ku me dixwest em şevbuhêrkeke wêjeyî çêbikin, yan em dadiketin qebo ya binê erdê, yan jî bi dizî û li ber siya tirsa ji serdegirtinên muxaberatan çêdibûn. Gava hatim Ewrupayê min dît ku derfet heye di televizyoneke Kurdî ya ezmanî de û ne di qeboyan de û bêyî tirsa biserdegirtina muxaberatan, em dikarin wisa eşkere behsa wêjeya Kurdî bikin. Mîna tîyekî ku here ser avê min dest bi vî karî kir. Yazde salan, di MezopotamyaTV, MedyaTV û RojTV de, bernama mina wêjeyî"Gava sêyemîn" dewam kir. Piştî rawestandina weşana RojTV û heta niha di RonahîTV de bernama mina "Deriyê din" her ji pazde rojan carekê tê weşandin. Destpêk weha bû. Bi demê re çêkirina vê bernamê ji bo min li xerîbiyê bûye mîna pencereyekê ku bêhna min pê derdikeve. Nexasim piştî ku hem ji civaka Kurd û hem ji derûdorên wêjeyî yên Kurdî û sûrî jî qut bûm. Heta niha bi zêdeyî sêsed û pêncî nivîskarî re ji her çar perçeyên Kurdistanê li ser berhemên wan bi wan re axivî me. Vê yekê li ser asta wêjeyî û li ser asta takekesane jî gelek hêz û hêvî da min.

- We li biyaniyê kovara Dîwara derdixist û ew kovar li her çar perçê Kurdistanê dihat belavkirin, çima hat rawestandin?

Yek sedem heye ku heta niha kovareke Kurdî serbixwe û birêkûpêk tune ye, ew jî aborî ye. Li pêşangeha pirtûkan ya Frankfurtê ya 2012an, Agirî Soran ku yek ji evîndarên zimanê Kurdî ye, ji min re got; ku ew ji bo aliyê aborî yê kovarê û ji bo belavkirina wê jî amade ye. Bi vî awayî me lihev kir ku em kovareke temendirêj û bi awayekî profesyonel derxînin. Min xwe da ber edîtoriya kovarê û me bi Cemîl Oguz re jî li hev kir da ku berpirsiyariya nivîsaran bigre serxwe. Herwisa me pilanekî berfireh dabû ber xwe, da ku em li her perçeyekî Kurdistanê şaxekî wê ava bikin. Me deh hejmar derxistin. Ji ber ku rewşa aborî ya Agirî Soran kete tengasiyê, kovara me jî nema karîbû berdewam bike.

- Dibêjin ku Helîm Yûsiv hemû sînoran di nivîsandina Romanê de derbas dike, ev tişt rast e?

Ez nizanim mebesta te bi sînoran li vê derê çiye, lê bi awayê ku ez dinîvisînim sînorên min di nivîsandinê de hunerî û wêjeyî ne. Ji bilî wê û ji bo afirandina deqekî astbilind û serkeftî û bi kûrahiya hest û hişê min re dilsoz be, ez ti sînoran û ti xetên sor nas nakim. Ev gotin rast e.

- Di nerîna te de, xwendevanê romanên bi zimanê Kurdî hene?

Di baweriya min de romana baş wê karibe xwendevanê xwe bibîne. Dibe ne li gor daxwazê be, wisa jî dibe ku romana Kurdî ne layiqî vê paşguhkirin û kêmxwendinê be, lê derûdoreke ku piraniya wê ji xwendekaran pêk tê heye, ku romanên Kurdî dişopînin û dixwînin. çapa yekê ya hemû berhemên min ên bi Kurdî qediyane û niha çapa wan ya duyem derketiye û hinek ji wan jî çapa sêyem e. Eger neyêne xwendin, ew pirtûk hemû bi ku ve çûn?. Rast e, derûdorên xwendina bi Kurdî, ji ber sedemên têne zanîn, sînorkirî maye, lê dema em bêjin xwendevan tune ne, em neheqiyê li wan derûdoran dikin.

- Hûn çima bela xwe li nivîsandina helbestê nadin?

Dema em sefa yazdan bûn, mamosteyê me yê zimanê Erebî helbestvan Cemîlê Darî bû. Pola me dora sîh hebî bûn, ji wan zêdeyî bîst heban helbest dinîvisandin û min tenê çîrok dinîvisandin. Me hemuyan, ji bo nirxandin û sererastkirinê, nivîsên xwe pêş mamostê xwe dikirin. Balkêş bû ku mamoste Cemîl ji hemuyan bêhtir guh dida çîrokên min û vê yekê bêhtir ez bi nivîsandina çîrokê ve girêdam û ji helbestê dûr mam. Ji wê dema destpêkê ve, heta niha ez tenê xwendevanê helbestê me û helbestan nanivîsînim.

- Berhemên Helîm Yûsiv ên bi herdu zimanan hatine çap kirin çend in û çi ne?

- Berhemên min yên ku heta niha bi Kurdî û erebî derketine ev in: Mêrê Avis - Jinên Qatên Bilind ku pirtûkên çîrokan e. Ji romanên min Sobarto û Tirsa Bê Diran, bi herdu zimanan hene.

- Gelo berhemên we, hatine wergerandin, û bi çi zimanan hatine wergerandin?

Ji bilî Erebî û Kurdî berhemên min "Mêrê Avis" bi Elmanî derketiye, "Mirî Ranazin", "Tirsa Bê Diran" û "Gava Ku Masî Tî Dibin" bi Tirkî derketine. Pênc pirtûkên min li Îranê bo Farisî têne wergerandin û heta niha ji wan "Mirî Ranazin" derketiye. Wekî din wergera "Gava Ku Masî Tî Dibin" ya Ingilîzî qediyaye û sala bê, wê li Ingiltere bê weşandin.

- Gelo romannivîsê Kurd dikare li pey nivîsandina romanê, nanê zarokên xwe qezenc bike?

Ez bi xwe ji bo debara jiyana xwe û ya zarokên xwe karekî dikim ku ti têkiliya wî karî bi wêje û edebiyatê re tune ye. Nizanim li Başûr nivîskarên Kurd ên ku debara xwe û zarokên xwe ji nivîskariyê dikin hene yan na, lê ez ti nivîskarekî kurmancî nas nakim ku karê debara xwe ji nivîsandina bi Kurdî bike.

- Gelo romannivîs ne di nav rewş û bûyerên romana xwe de be dikare wê romanê bi awayekî serkeftî binivîse, wek nimûne romana te "Tirsa Bê Diran"?

Dibe hinek nivîskar hebin ku ne di nav bûyeran de bin nikaribin romanên xwe bi awayekî serkeftî binîvisînin. Lê ji bo min nivîsandin bi giştî û ya romanê bi taybetî meseleyeke hundirîn e û girêdayî şewt û jana giyan û rihê min e. Hin tişt hene, mîna diya mirov, mîna welatê mirov, ew bi mirov re dijîn. Ez diçim kuderê welatê min di bin çengê min de ye. Rihê dayika min jî her gav bi min re dijî. Ez li Elmanyayê dijîm, lê dikarim niha bi rehetî li ser bûyerekê ku duh li Amûdê qewimiye binîvisînim. Rast e, ez ne li Amûdê me, lê Amûdê li vir bi min re ye. Bûyerên serhildana Qamişlo kêlîk bi kêlîk, seet bi seet, me şopandin. Belkî ji kesekî ku li wir dijî jî bêhtir. Şer û berxwedana Kobanî kêlî bi kêlî, gav bi gav, me şopand û têkiliya mina hema hema rojane bi hin şervan û kesên di nav bûyerê de bûn re, hebû. Hîn di dema şer de, min û hin kesên li Kobanî dimînin, me bi hev re meteryalên romanekê amade kirin û min beşekî baş jê nivîsandiye. Ez dikarim li ser her agirê ku serê tiliyên min bişewitîne binîvisînim. Ew agir bela li Efrîqya be jî, madem ku dikare vê volkana nivîsandinê ya di hundirê min de razayî şiyar bike, ez ê karibim li ser binîvisînim. Romana mina "Tirsa Bê Diran" jî bi vî awayî hat nivîsandin. Romannivîs ne mamosteyê cografyayê ye û ne jî endezyarê kolanan û divê wan bipîve, da ku bê li bajarekî bigere heta ku li ser binîvisîne. Romannivîs avakarekî rûhanî û endezyarekî hestan e.

Gotina Dawî ...

Rojekê ji rojan xewneke min bû ku li Amûdê yan li Qamişlo em karibin kovarekê yan rojnameyekê bi Kurdî derxînin. Sipas ji bo ewên ku jiyana xwe dan û zemîna vê xewnê bi xwîna xwe li ser vê axê amade kirine û sipas ji bo we jî ku hûn vê xewnê cihbicih dikin.

Pirtûkên Helîm Yûsiv heta niha:

1-Mêrê Avis –Çîrok – 1991
2-Jinên Qatên Bilind – Çîrok – 1995.
3-Mirî Ranazin – Çîrok – 1996
4-Sobarto – Roman – 1999.
5-Memê Bê Zîn– Çîrok – 2003
6-Tirsa Bê Diran– Roman – 2006
7-Gava Ku Masî Tî Dibin – Roman – 2008
8-Romana Kurdî -Lêkolîn- 2011
9-Ausländer Beg –Çîrok- 2011
10- 99 Morîkên Belavbûyî – Roman - 2015

Kesên Sexte



Salihê Heydo

Kesên sexte bi dev kurd in
Di peyvan de wekî şêr in
Zimanê wan dirêj e bes
Derwçîn in çi pir çêr in
Digel qîz û jin û bûkan
Gelek zirtên xwe dubhêrin
Ji dijmin re dibin kole
Bi erzanî xwe dispêrin
Di kolan û zikakan de
Ji hev re kêr û penêr in
Li dora hev bi pîlan in
Di qexbû de kewê nêr in
Heyab' hev re ne dilsoz in
Li xwe û gel derewdêrin
Ji derve tît û tîtal in
Ji hundir de çi qilêr in
Girêka kûr û tev jan in
Di pişta gel de kwînêr in
Ji ber ku dostê neyar in
Hemî fût û fen û fêr in
Di ber deryan de patoz in
Kunojin tev de ziktêr in
Ku şoreş saz dibî rastî
Dibin çavan re dinhêrin
Ji tirsan re welat berdan
Bi ser nizmî xwe vedşêrin
Ji bo tişkî tenê jîr in
Perên dolar dihejmêrin
Li ser pişta belengazan
Dikin çentan û lêd' çêrin
Di warê rast û ruhnî de
Tu halbik tev de bêkêr in
Jinên xwe bes dikin himbêz
Di gel wana çi xew xêr in
Li xwîna wan şehîdên kurd
Qe napirsin qe nanêrin
Besib' qat û gerafêt in
Li şûşa xwe çi guhdêr in
Wekî kose û ber kose
Di sûka reş de alvêr in
Bi agrê xaniyê milet
Firîkên xwe dikizêrin
Gelek şerme ku serwer bin
Ji ber nizm in û berjêr in
Nikarin hilkişin jorê
Ne bazê pozê zinêr in
Kesin kurtêlxwer û hîz in
Ji bo dozê ne şevgêr in
Bes e malî ne avabe
Jiwem' têrin ji we têr in
Di nav gel de we cih nîn e
Herin hûn ney ciwamêr in
Çikû ew paxirê qelp in
Li doza kurd ne guhdêr in
Tenê şerkar û şoreşvan
Li meydanê ewê zêr in
Ewin cê hêviyê îro
Ji xwînê re çi heqvêr in

Ba Ji Perwazê Mene Ji Giyanê Qasimlo re""

Xalid Umer

Roj hilat va roj hilatî
Pertew endazê mene
Xweş biner dimdim çi berze
Ev ferî nazê mene
Sîperan ezman qulaptin
Ba ji perwazê mene
Celweyû kolayê latan
Neqş û şêwazê mene
Manî û Zerdeşt du bazin
Ew li evrazê mene
Sîneyên korş û peyên wî
Xwîn ji rimbazê mene
Navbera stêr û sitêrê
Rêç û boxazê mene
Xindirîn tacê herî reş
Gewd li ber pazê mene
Hersî goşên xesrewanî
Herifîn, mazê mene
Ew kevana mezdekê sor
Ayet û razê mene
Ey reqîb her emro dunya
Saz û awazê mene

Li Hêviya Te

Îmad Hemdî

Li hêvya te serê min
Sipî bû çilmisîn dêm
Bi qurbana te bim ez
Ne bêje ez nema têm
Hinav û dil li ser te
Tev perçe werçe bûne
Çavêm ne çûne ser hev
Heta bêjim vebûne
Ji zûve bendewar im
Jiyan bê te nexweş e
Hela reşşa şeva min
Çima roja min reş e
Mi' emrê xwe li ser kir
Evîna te bike lez
Were ez te bibînim
Nehêl poşman bibim ez
Emir çû min wilo geş
Nedî dilê xwe rokê
Çi tuştê hat serê min
Ji bo te ma ji bo kê
Tu xweş zane emir çû
Jidû çavê te wana
Hela emrê çû ew çû
Çima dûr e tu ana

Ber Nadim

Melevan Resûl

Bilbil li cem gulê rûnişt
Xunav ji ser dêm sorê mijt
Ne wî sax kir ne jê wî kuşt
Çimkî bihar hat bû dem e
Buhar li me hate Adar
Revî sira wî çilê sar
Nû bişkuvî gul û çinar
Roja nûre eleste me
Me'brondika xwedî kirî
Nema sorgul bidet girî
Ji feriştan bûye Perî
Bonî dilan bû melhem e
Ew şerbeta Eynê Heyat
Çîçek ji rengînê Nebat
Silava rê dikim du pat
Bo reş rîhana ber çema
Min şevreşa xew vedizîn
Rûbar ji ber gul vebizîn
Avda du dêmê lerizîn
Da şaxê xwe berdê lema
Berfa li ser sor bûbû pûk
Fir, firî çûn teyrik û çûk
Gul sor dinav de mabû bûk
Şiv darê rût hatin sema
Nisrîn gula sorî bijart
Nava baskê xwe de veşart
Pişta xwe li çiyê sipart
Çîyan ve bûme wek şima
Bernadim ez gulka binefş
Vê narîna ciwan keleş
Da negrê dêma perdê reş
Rizgar bikim wê ji xema

Tême Sotin

Şivan Mihemed

Hewar .. Tême sotin
Ji agirê awiran
Tayê mûmê me
Herdû Bê lebat in
Can û ceger, bû ferman
Xewnekim.. !? kî me!..?
Ev ne ti xelat in
Xewn û girî û leylan
Ma qereçî me!?
Dijmin in ne dost in
Evîn û hest û peyman
Ne reş, sipî me
Dar im ..
Dest tavêjime ezman
Tazî di bim, çivîk ditirsin
Fîxan im ..
Bi xwîn û hêsir im
Ma gelo cîhan dor û das in
Evîndar im ..
Cangorî me lê…
Dor me Beko ne ne mêrxas in
Welat ..
Nafroşin .. Ne guhbel in
Em tolavan in, pîxwas in

Destê Hevalê Min û Hêlîna Hechecîkan "Keçika Min î Piçûk,Ya Li Tenişta Min Razayî"

Hesen Helîmê

Çiqasî rûwê wê xweşik e, wek rûwê hevalê min î mirî ye, li çavên wê yî girtî dinehêrim, çavên wê dibin kerwanek ji çavên hechecîkan, hechecîkên ku li benda kevirên min in, çav berra dû min didin, direvim, pêrgî ewirekî teng têm ewirekî ez tê de hilnayêm, ewir sîka min bi zorê ji min distêne, sîka ku bi rengekî yan bêtir, bûye hevalê min, sîka min î geh kin, geh ji min dirêjtir, geh li vî alî min, geh li wî alî, sîk min dike mirovekî pîr, ku ji tenahiyê hez dike, û nişkave xwe dibînim di nav birrek zarokên bêlevz de. Ez dihêm ber çavê xwe, hevalê min î mirî jî bi min re ye, destê xwe dide ber kevirê ku ez davêjim hêlîna hechecîkan, û her çavên wan balendeyan ji dev min bernadin, hevalê min î mirî bi destê min digire û baz dide, min bi xwe re direvîne, li kulmek bîranîn dilikumim, û di nav de radizêm.

Ez Bi Xemgînî Hatime Dorpêçkirin

Ehmedê Kurimî

Xemgîniyên jiyana rojane ku tu kes jê ne parastî ye, eger ku em evê rasteqîniyê berçav bikin, em hindek ewlehî û dilxweşiyê didin xwe, dema ku hay û hestên meyî hundurîn (derûna me) me hay dike ku hindek kesêd mîna me hene, ew jî bi me re hevbeş in di evê sergêjî û xemgîniyê de ne û weke me ew jî bi rojeke geş û xweştirîn lav û arazo dikin, mirov bi hestekî aram û bi ewle li jiyanê dinêre. Eger em ev ê helwestê ber biçav bikin û bibêjin: Ne em tenê di evê rewşê re derbas dibin û pirr xelk weke me hene ku di bin ev ê givaştinê de ne, wê hindekî bar û êş û azarên me sivik bibin . Erê .... eger em bi haydarî binêrin û bizanibin ku ne em tenê xembar in, lê bi hezaran weke me hene û bi me re hevbeşiya evan derd, kul, û xeman dikin, ewê gavê hindekî ew derd, kul, û xem bi sivikayî bandora xwe li me dikin. Lê berovajî evê ramanê ku em hay û hestên xwe bi giştî di kul û derdan de mijûl bikin, û pêşwaziya kêmasî û xemgîniyan bikin, wê gavê ew xemgînî tev wê li me siwar bibin û wê Bandoreke xurt li derûn û jiyana me bikin û emê di bin fişareke zor de bijîn, eger mirov bi koranî di evê pirsgirêkê de raman bibe, wê bizanibe ku hemû fişar û nakokiyên jiyanê, tenê hay û hestinî di bin fişara kar û ramanên ku bêhtirî karîbûna merovan in, û ne çîrok serpêhatiyên tekez in.

Mêvandariya Mirinê

Jînda Mihemed

Mirin..
Mêvaneke giran e
Lê can sivik bû ye
Ji pirbûna çûn û hatinê
Li vir ..Mirin nema mêvan e
Lewra ku Miftî
Weke me û bêtir ... Nas dike
Mirin.. Bacbireke zîrek e
Bacbireke bêdad e
Li derdora xwe dinêre
û bi pozbilindî
Talanên xwe dijmêre
Yek.. Do .. Sê.. çar
Li ba wê hejmar in
Li ba me dost û yar in
Yek.. Do .. Sê.. çar
Li ba wê hejmar in
Li ba me
Xwişk û biran e
Heval .. Û cînar
Yek.. Do .. Sê.. çar
Ma te çi di Miftî de hişt
Ey mirina reşemar
Mirinê
Dilê min kir goristaneke mezin
Ji laşên keçên nazik re
Bûkên Newrozê re
Ma we ji bo mirinê
Xwe xemilandibû
Keçnooo
Mirinê çavê min kir
Koneke şînê
Ji zarokên rengereng re
Findên Newrozê re
Ma kê ji we xwestibû
Ku win sorê di alê de
Sortir bikin
Goristan bi saw e keçno
Ma win çawa roj û şevan
Diqedînin
Kon ..Kon cihê rondika ye
zarokno
Û ji bilî ken li riwê we
Yê geş nayê
Mirin.. Di ber min re çû
Bi lezgînî silav kir
Karê xwe xê pir berdewam kir
Min silava wê vegerand
û min jê re got
" Me te bi xwe re westand
van çend salan
li vê taxê "
Di bin çavan re li min nerî
Keniya, û piştî çû
Ez bûme fedîkar
Ji wî kerwanê laşan
Yê ku ji nav dîlana me
Hate helbijartin
Û bi dû mirinê ket
Ku bûne qurbanên jiyaneke nû
Ji me re
Lê em jî
Li hêviya mêvandariyeke nû ne
Ji mirinê re
Li benda Newrozeke nû ne
Helbçeke nû ne
Ta ku em bighêne we
Ji ber ku bi rastî
Me bêriya we kiriye

Çeteyên Derya (Deryagêr)

Riyad Salih El- Husên Ji Erebî: Fewaz Ebdê

Min ji gemiyan re got:
Heger te deryagêr
Bi şûrên wan ên dirêj, û
dilên wan ên kerr
dîtin
Ji wan bipirse:
Çima nikarin deryayê bidizin?
Min ji mirinê re got:
Çaxê tu bê jiyana min wêran bikî
Omîd ew e ku
Tu bi nermî wêran bikî!
Dîsa min ji mirinê re got:
Nêzîkî min nebe
Da tu hustuşikestî
li diya xwe venegere.
Çend Nemre
Her tişt li ba me heye:
Milyon nan ji milyon birçiyî re
Milyon ramûsan ji milyon evîndarî re
Milyon xanî ji milyon penaberî re
Milyon pirtûk ji milyon şagirtî re
Milyon text ji milyon westiyayî re
Her tişt li ba me heye:
Ji havînî re, derya
Ji zivistanî re, sobe
Ji tirênan re, gelek rawestgeh
Ji cîhangeran re, şûnwar û kamêra
Her tişt li ba me heye
Lê piraya me, ne pere hene û ne fîşek
Ji lewra divê em gelekî dilên xwe xweş nekin!.

Roja Heşrê

Dilşa Yûsif

Di roja heşrê de
Sê qîzên Kurd
ji Dêrsim..
ji Enfal..
û ji Şengal..
pêxwas..porbij..
tî, birçî..
bi saw..û matmayî..
ji cerg û qîzaniya wan
xwîn dilop dilop diherikî
Li ber dergehê Xwedê ..
pêkve rawestan.
Qîza Dêrsimî..
bi girî..
bi hewar..
got: Xwedêyo..
zarokên te ..
nûnerên te li ser xakê..
hilgirên ala te
neviyên Xîlafeta Osmanî
bi navê te..
min talan kirin..
min ji şeref û namûsa min bêpar kirin.
Zarokên te..
zarokên min..
bi serê singoyên tivingan vekirin.
Hîna jî ez gêjim
ji bihna xwîna
dê..û bavan
mam û biran
li kêleka min
di nav xwîna xwe de vedigevizyan..
Îjar ev heşra bo çi ye?
Em yên Kurd ji mêj de heşir bûne gelek ji mêj de.
Qîza Enfal jî xwe negirt
Hawar kir, gazî kir..
û got:
Ew e heman çîroka min e.
Bi bîra min tê,
gelek ji mêj de em heşir bûn,
dema zarokên te
hilgirên ala (Ellahû Ekber)
ji biyabanan hatin
û hemû kesên min
enfal kirin..
û min bi talan birin..firoştin ..
Hîna jî ez wenda me..
li wê tarîkstana biyabanan
û hîna bîna kîmyebaranê
ji devê min tê.
Qîza Şengal jî
bi kirasekî sipî..
bi çavên xweyî şîn

Mirina Bi Rûmet

Hoşiyar Le'lê

Mirina bi rûmet şoreş e
Mirovê dilsoz e pê geş e
Azadî ye gelek xweş e
Bang e, Hêvî ye, Hewar e
Guhertin e jî bo nexş e
Bang e Ji bo hemî
Dilsoz û evîndaran
Biliv kar bin wekî cara
Bes e hêdî dem hatiye
Hey hewar e..
Heta kengî em ê ho bin
Di bin destê van hovan bin
Qelenê vê rûmeta xwe
Me pir daye
Lê mixabin bê mifa ye
Çimkî em parçe û par in
Dijî hevdû de li kar in
Ji lewre îro di rewşê de
Bê biryar in ...bê biryarin
Saykis Bîko hilfa Bexda
Rêkeftinin çi gemar in
Rêkeftinên li ser Kurda
Her li dar in
sê qolî ne çar qolî ne
Her dem ji bo me li dar in
Bi hev dikin li ser Kurda
Ji wê pê ve tu nikarin
Li hemberî van dijminan
Em jî parçe ne, bê kar in
Bihev nakin bi nakok in
Lev siwar in
Rewşa me Kurda weha ye
Bê serdar in
Ji lewera îro em bindest in
Penaber in em bê çar in
Belav bûne li cîhanê
bê nasname û hejar in

bi mistek ji agirê Laleşa pîroz
bê deng..matmayî
li ber dergehê Xweda rawestabû..
belê hemî endamên laşê wê
bibûn ziman
pêkve hewar dikirin ..
digotin:Ey Xwedê ..
ez jî di rojek ronak de
li ber cavê hemî cîhan
hatim talan kirin..
her li jêr alayek reş ..
û li jêr navê te..
(La Îlahe Illa Ellah) de
hatim sebî kirin..
hatim serbirîn..
Hîna jî min di nav malzaroka xwe de
tûvê heramê sedan
zilamên serbir hilgirtiye.
Agirê Laleş vemiriye..
û çiyayê Şengal jî
xwe bi termê sedan zarokên min xemilandî ye
Îjar ez nizanim hey Xweda..
Ev e heşr e?
yan heşra bê dawî
li Şengala minî sebîkrî..
û serbirî niştiye.
Aramiya Azadiyê
Ey xewna kûr
dema hemi hêvî
bi dawî dibin
dilê min
heta li ser tarîtiyê jî dişewite
bi vê ronakiya zuha
wek leylanê
li ser xakê.
Ey welatê yekem
û dawî
hîna jî ez
bi aramiya azadiyê
zengilên hevgihînê lêdidim.
Lê belê..
Li ser vê xakê..
her tişt bi xemgînî derbasdibe
wek şopa cengê
wek şopa mirinê.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Dizan Ji Dizan Dizî, Er'd û Ezman Lê Pirsî

Bavê Amed

Bê destpêkirin û pêşgotin, bê tîsk, fen, û fort, bi hêvî me mijar bê xwendin ta ku rastî zelal bibe û bê xuyakirin.

Di van demên dawî de, bi taybet li bajarê Amûdê. Bê jimar, gelek dizî lê tê kirin (çi mal, dikan, firne, û dibistan) h.w.d

Bi rastî sê diziyên giran û bê hempa bala min kişandin.

1- Dizîna firoşgehek laptopan ya birêz Bengîn.

2- Dizîna pirtûkxana Ixlas a mamoste Fadil.

3- Dizîna navend û pêşangeha Mobaylan ya birêz Xesan Osman.

Bê guman her sê jî li bajarê Amûdê bûn, yekemîn û duyemîn heta roja îro nehatiye zanîn û naskirin bê kê dizya wan firoşgehan kiriye !

Di 7ê meha yekê, sala 2015an de, piştî nîvê şevê navenda Mobaylan ya Xesan Osman li ser rêya Hesekê rastî diziyeke giran hate kirin û bi qasî 17 hezar Dolaran mobayil ji wê pêşengehê hat dizîn ! sibehê zû Xesan Osman piştî nas kir ku pêşengeha wî rastî diziye hatiye berê xwe da Asayişa Amûdê û ew agehdar kir bi bûyera dizîkirina navenda xwe Ji wan re got, pê re di nava çend rojan ji şopandin û lêkolînê, Asayiş gihiştin hinek zanyariyan û pê re hino hino pênc şeş kes hatin girtin û li zindana bajarê Amûdê bi cî bûn.

Ew çend kes bi qasî çar mehan di girtgehê de man. Tiştê herî balkêş ew bû ku bêyî tu îşkence, lêdan û tengasî ew kesanan li xwe mikur hatin û li ser rûpelan mor kirin û xwe gunehkar kirin, û gotin me ew mobayl dizîne !

Lê xwendekarên hêja û bi rûmet.. piştî pirsîn û lêpirsînê, beyî ku serê we bêşînim û agahiyên hûr, kûr û dûr binivîsînim, çi li vir û çi li wir û hiş û mejiyan we tev li hev bikim, û piştî çar mehan her wir û wer vir û geh dehê mehê û geh bîstê mehê û geh jî serê mehê ew şeş kesane bê suc û guneh û dadgeh serbest hatine berdan bêyî çavdêr û dîtnêran, bêyî tu parêzer û dadgehan vegeriyan malên xwe û her kesê pê zane seyr û matmayî man.

Ew dizanan kî bûn?

Çima diz serbest tên berdan?

Kî berpirsyar e?

Gelo diz gîhan mafê xwe?

Mobaylên Xesan li kuderê man?

Kesên mexdûr doza mafên xwe li kê bikin?

Gelo diz jî mirov perwer in?

Gelo wê nivîskarê gotarê têkeve bin çavdêriya dizan?

Çîroka çîvanokê, xetxetokê berda cîhokê, cok miçiqî golka xala li piş mala, ne gur duxwe û ne diz dibe!

Mijara min li diyaran mehreyî li dê û bavên xwendekaran ji bilî cendirme, tehsîldar, beko ewan û kedxwarn.

Li Amûdê Ahengek Bi Helkefta Bidawîbûna Sala Dibistanê

Navenda Newroz Bo Vejîna Civaka Sivîl li Amûdê, bi alîkariya Komeleya Solîn Bo Guhdana Zarokan û Komeleya Nûjiyan Bo Kesên Astengdar di roja 21-5- 2015an de ahengek rêzgirtinê bo zarokan bi helkefta dawîbûna sala dibistanê lidar xistin.

Armanca ahenga ku bi beşdariya 25 zarokan bû derbaskirina kêfê bo dilê zarokan û bi taybet yên astengdar bû. Di ahengê de gelek çalakî û stran hatin pêşkêşkirin, û herweha gelek diyarî jî li zarokan hatin belavkirin.

Fatima Seyda Seroka Komeleya Nûjiyan bo Zarokên Astengdar ji rojnameya Bûyer re axivî û got:"Armanca me ji lidarxistina vê ahengê derbaskirina kêfxweşiyê bo dilê zarokan e ".

Li Amûdê Workşopek Rahênanê Bo Birêvebirina Qîranan û Stendina Biryara Aktîv

Ji ber hewcwedariya saziyên Civaka Sivîl li deverê bo birêvebirina qîranên xwe û têkbirina wan, herweha çareserkirina pirsgirêkan di hindirê saziyan de bi awayin zaniyarî û nûjen, Navenda Newroz Bo Vejîna Civaka Sivîl li Amûdê, workşopek rahênanê di bin navê " Birêvebiriya Qîranan û Stendina Biryaya Aktîv" lidar xist.

Di vê workşopa rahênanê de Komeleya Nûjiyan Bo Zarokên Astengdar, û Komeleya Solîn Bo Guhdana Zarotiyê beşdar bûn, û di bin rêvebiriya her du rahêneran; Umer Hac Nûrî û Mistefa Remedan.

Hêja ye gotinê ku vê workşopê du rojan berdewam kir.

Pêşengehek Bo Giringtirîn Şûnwarên Xabûrê Li Navenda Mihemed Şêxo Lidar Ket

Desteya Jîngeh, Geşt û Şûnwaran, û bi boneya Cejna Şehîdan di roja 18- 5-2015an de, di bin navê " Qîrîna Kevirekî" li Navenda Mihemed Şêxo û bi amadebûna hindek ji nûnerên destyên Rêvebiriya Xweser, kesayetin siyasî, û hejmarek ji cemaweran yên guhdêrên şûnwaran pêşengehek wêneyî bo giringtirîn Şûnwarên Xabûrê lidar xist.

Hejmarek ji tabloyên wêneyî ku bi sê zimanên pêkhatiyên deverê hatibûn şîrovekirin (Kurdî – Erebî- Suryanî) hatibûn pêşkêşkirin.

Pêşingeh mîna destpêşiyeke cedî ji hêla desteya Jîngeh, Geşt û Şûnwaran di Rêvebiriya Xweser de, bo pênasîna nifşê nû bi keleporê wan û xutkirina girêdana wan bi xaka wan ve hatibû pêşkêşkirin.

Di vê derbarê de Luqman Ehmê Serokê Desteya Jîngeh, Geşt û Şûnwaran li "Kantona Cezîrê" ji Rojnameya Bûyerpress re got: " Ramana lidarxistina pêşingehê ji mêj ve hebû, me xwest ku em di roja Cejna şehîdan de ragihînin, ta ku wek wefadariyekê ji xwîna wan kesên ku dixwazin rastiyê diyar bikin re be, ji hêleke dî ve me xwest em van rastiyên dîrokî li Kantona Cizîrê belge bikin"

Kovara " Asoya Jinê " Mûma Salvegera Xwe Ya Yekemin Vedimrîne

Di roja Yekşemê de 24-5-2015an endamên kovara " Asoya Jinê " mûma salvegera xwe ya yekem li hola El _ Rewabî li bajarê Qamişlo, û bi amadebûna hejmarek mezin ji rêxistinên jinê û ciwanan vemirand.

Bi helkeftê gelek gotin hatin pêşkêşkirin; ji wan gotina seroka Yekîtiya Stra Welîda El _ Bûtî. Gotina Endama Encumena Zagonsaziyê Perwîn Mihemed. Gotina Endama Yekîtiya Ragihandina Jinê Jiyan Hêvî. Gotina Edîtora kovara " Asoya Jinê " Etiya Bellî. Gotina nivîskar û helbestvan û endama kovarê Nêrgiz Ismaîl. Û Gotina hunermenda Kurd Canê.

Di dawiya ahengê de grupek ji daykên şehîdan bo qutkirina qalibê Gato hatiin vexwendin, û li amedebûyan hate belavkirin.

Derbarê vê mijarê de Nêrgiz Ismaîl Endama Kovarê ji Rojnameya Bûyerpress re axivî û got: "Ev roj bo me rojeke taybet û dîrokî ye, me xwest em nameya xwe ya dîrokî bo jinê ragihînin ku ji îro û pê ve nema pênûsa wê bêdeng dimîne" .

Ismaîl wisa berdewam kir:" Salek di ser damezirandina kovarê re derbas bû, gelek astengî û kelem ji me re derketin, lê beramberî vê yekê jî me dikarîbû bingehek xurt di warê ziman û pênûsa Kurdî bo kovarê biçespînin ".

Endama kovara Asoya Jinê wisa axivtina xwe bidawî kir:" Di hejmara 13an de gelek guhertin ji hêla Logo û quncikan de pêk hatin, di hejmarên bê de em ê helbest û gotaran bi awayekî berfireh biweşînin, ta ku kovar bibe dengê jina azad di jiyaneke azad de".

Li Hesekê.. Partiya Pêşverû Roja Zimanê Kurdî Bibîr Tîne

Nivîsgeha Partiya Dimuqrata Pêşverû a Kurdî li Sûrya – Şaxê Hesekê, û bi amadebûna cemawerek mezin ji rewşenbîr, nivîskar, û guhdêrên zimanê kurdî semînarek taybet lidar xist.

Ibrahîm Xelîl Endamê Yakîtiya Nivîskarên Kurd – Sûrya, di semînera xwe de li ser dîroka Elfbeya Kurdî, qonaxên pêşketina wê, û rola Mîr Celadet Bedirxan ya sereke tê de axivî. Behsa derçûna rojnameya "Hawar" di mîna wê rojê de (15 Gulanê sala 1932an) û bi tîpên Latînî kir. Û anî ziman ku guhertina mezin û bingehîn di nivîs û xwendina Kurdî de di wê demê de çêbû.

Di dawiya semînarê de rêzname ji nivîskar Ibrahîm Xelî û Helbestvan Salihê Heydo re hate pêşkêşkirin, herweha girupek ji şagirtên zimanê kurdî jî bawernameyên zimanê kurdî wergirtin, û hindek belavok li ser dîroka zimanê Kurdî hatin belavkirin.

Maratona "Bi Gavin Mezin Ber Bi Hêviyê De Diçin" Li Amûdê Bidawî Bû

Navenda Elbera`im " Bo Geşpêdana Behremendiyên Zarokan " li Amûdê roja înîyê 22-5-2015an Maratonek bazdanê bo zarokê Amûdê re di bin navê "Bi Gavin Mezin Ber Bi Hêviyê De Diçin" lidar xist, ew jî bo alîkariya wan di warê derûnî de. Maratona ku saet 6ê êvarê destpê kir, zarokên ji temenên (6-8), (9-11) û (12-15) tê de beşdar bûn.

Buşra Şêxê Birêvebira Navendê ji rojnameya Bûyerpress re got:" Ev yekem çalakî ji navenda me re ye ku li Amûdê lidar dikeve, em hêvî dikin ku me hindek ji armancên xwe pêk anîbe".

Aram Ehmed Birêvebirê Nivîsgeha Ragihandinê li navendê wisa ji me re axivî: " Ne giring e ji me re kî biser bikeve an bibin bikeve, armanca me ya sereke ji vê maratonê piştgiriya zarokan di warê derûnî de ye".

Encamên vê maratonê bi kurtayî ev bûn:

1000M – Law: Mihemed Xêr Ehmed – Ebdilezîz Ehmed – Meed Fewaz

1000M – Keç : Zeyneb Hisên – Albîn Mihemed Xalid – Meyada Hisên .

750M – Law: Fuad Ebdilezîz – Adil Deqorî – Mihemed Elî Salih Hisên

750M – Keç: Efrîn Ehmed – Neda Fewaz Tunc – Necah Mahir Hemo.

500M - Law: Hesen Xalid Ibrahîm – Hisên Remedan – Rêzan Xalid Hisên

500M – Keç: Fatima Ehmed Ehmed – Mîrna Şêxmûs – Malva Remo.

Hêja ye gotinê ku Navenda Elbera`im di 1-11-2014an de hatiye damezirandin, di geşpêdan û şopandina karê zarokan di warê şêwekarî, mûzîk, şano, helbest, û hin warên dî jî pispor e.

Yekem Pêşengeh Ji Berhemên Kargehan Re Li Bajarê Qamişlo

Yekîtiya Kargehan li Qamişlo pêşengehek bo berhemê kargehên li Qamişlo hene li hola Zozan vekir. Pêşengeha ku 3 rojan berdewam kir 23 kargeh tê de beşdar bûn. Û berhemên cur be cur pêşkêş kirin.

Hêja ye gotinê ku ev pêşengeh ya yekem e li deverê û wek pêşniyar ji hêla Yekîtiya Kargehan bo pênasîna bi giringtirîn kargeh li deverê bidin xuyakirin.

Berzan Mustefa Serokê Komîta çavdêriyê a Yekîtiya Kargehan li bajarê Qamişlo ji rojnameya Bûyerpress re got: " Armanca me ji vê Pêşengehê misogerkirina hêsankirina qîrana Sûrî çi ji hêla nirx û çi ji hêla bidestxistina vê berhemê di riyeke xwecihî re ye, ev yek welatiyên me rehet dikin nemaze di van rewşên ku dever tê re derbas dibe".

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Ajovanê Paşerojê Me...

kurdî

Xweş e

Pêşbînî	تكهُّن
Kişan	تمدّد
Pirjan	تناثر
Hevyekî	تناظُر
Guhlêkirin	تنصُّت
Raspandin	توصية
Cadûbazî	شعوذة
Gazindan	شكاية
Gwîzan	شفْرة
Karûbar	شؤون
Biraştin	شوي
Ciwamêrî	شهامة
Dilbijandin	شهوة
Bê oxirî	شؤم

Peyva wendayî

Ş	O	R	E	Ş	L	A	X
Ç	Z	A	N	L	I	D	B
Z	Ş	Î	D	X	A	R	U
Î	Ş	Ê	R	A	A	ç	H
Y	I	A	R	Û	R	N	A
A	R	A	L	O	D	O	R
P	Ş	A	H	Î	N	A	Z
D	A	R	N	Î	H	A	Ş

(şoreş-xal-buhar-şahîn-dar-şahînaz-daro-payîz-dilnaz-şêro-dûrî-xan-şal).

Peyva wendayî ji 7 tîpa pêktê, qadek navdare li Rojhilatê Kurdistanê.

Hejmara bûrî

D	Ê	R	I	K

Hejmara bûrî

8	2	4	5	7	3	9	1	6
1	7	3	2	6	9	8	4	5
6	5	9	4	1	8	2	7	3
7	3	6	1	8	2	5	9	4
5	8	1	9	4	6	3	2	7
9	4	2	3	5	7	1	6	8
3	1	8	7	9	4	6	5	2
4	6	5	8	2	1	7	3	9
2	9	7	6	3	5	4	8	1

Pend û şîretên kurdî

1-Gelî bê şîlan nabe !
2-Eyşokê bi fedî ye !
3-Darek tuneye ku ba lê naxe !
4-Cilika xizanan her tim qetyaye !
5-Bez nesipêre pisîkan !
6-Kar bi kirinê, ker bi ajotinê !
7-Pîrê bi limêj e, sal dûdirêj e !
8-Ji ber derdan rî berda !
9-Îro bi qurbana do be !
10-Hîn nebûye mirîşk,hêka jî dike !

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre,lê divê ku tenê carekê jimar were dagirtin di her malikê de,û herwiha tenê carekê were dagirtin li ser xêza asoyî û serjêr.

3	5		8	4				7
		7	2			9	5	
	4		6			1		
	2	5		9	1	7		
	1		4				3	
		6	5			2	9	
		4			6		1	
	9	3			4	8		
2				3	5		7	9

Mamik

- Dirêj e ne mar e, kej û hît e ne kar e, serî hişk e ji dar e?
- Kalo tê ji rê, bêndera stirîya li piştê?
- Ser sipî ye ne mele ye, pê panî ye ne deve ye?

Bersiva hejmara bûrî : Tenûr – Derya – Das

Xaçerêz

Asoyî

1-sûlav-tersê hat.
2-ji zayinê –dera berz û bilind.
3-kom.
4-sinc(b)-ji axînê yê.
5-peytexta komarek Kurdî ye.
6-tersê şiyarbûnê-tersê rabe.
7-tersê belê(b)-bo nîşana me.
8-belgeya bidawîkirina zanîngehê.

Stûnî

1-êş-şan.
2-tê vexwarin-amûşî.
3-ji balenda ye.
4-dera weşana Radio-agir(b).
5-tersê jêr-navekî lawan e .
6-tersê dereng-tersê nebû.
7-dera sazkirina pirtûk û kovaran.
8-tersê kevn(b)-yê ku ji Adem be.



Hejmara bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	p	Ê		r	O	m	a	n
2	a		p	ê	K	e	t	î
3	r	A		b	E	n		g
4	s		ş	a	k	î	r	a
5	e	d	û	z		s	a	r
6	k	o	m		ç		b	î
7		t	e	r	a	z	û	
8			d	i	r	û	n	î

Amadekirin: Xoşnav Heso